



## BERAWIRKIRINA KAREKTERA “NEWFEL Û SEHNEYÊN NEWFELÎ” DI LEYLA Û MECNÛNA NÎZAMÎ Û SEWADÎ DA

(PP 59 - 75)

**Nesim SÖNMEZ**

Assoc. Prof., Zaningeha Wan Yüzüncü Yilê, Enstîtuta Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda

Kurdî, Wan / Turkiya,

e mail: [nesimsonmez@gmail.com](mailto:nesimsonmez@gmail.com)

Tlf. +90 505 378 21 43

**Published: 29/10/2020**

**DOI: <https://doi.org/10.31972/jickpll19.05>**

### PUXTE

Çîroka Leyla û Mecnûnê bi rêya Edebîyata Ereban û Farisan xwe gihandîye Edebîyata Kurdan. Ev çîroka bi nav û deng cara ewil ji aliyê Nîzamîyê Gencewî va bi têşeya mesnewîyê, bi zimanê Farisî hatîye nivîsandinê û ji 4000 malikan zêdetir e. Piştî Gencewî, helbestvanên Faris, Kurd û Tirkan jî bi qalibê mesnewîyê bi zimanên xwe ev çîrok nivîsandine. Çîroka Leyla û Mecnûnê bi gelek zimanên din weke Îngilîzî, Almanî û Rûsî jî hatîye nivîsandin û li gelek zimanan jî hatîye wergerandin û bi vî rengî bûye çîrokeke çihanî. Di edebîyat Kurdî da gelek helbestvanan ev çîrok bi rengê helbestê hûnandine û diyariyî edebîyata Kurdî kirine. Ji wan helbestvanan yek jî helbestvanê Kurd Sewadî ye û wî, ev çîrok bi zaravayê Kurmancî nivîsandîye. Weke gelek helbestvanan Sewadî jî dema berhema xwe nivîsandîye di bin tesîra Nîzamîyê Gencewî da maye. Di nav berhema her du helbestvanan da beşên ku dişibihin hevûdin jî hene yên naşibihin hevûdin jî hene. Di her du berheman da jî karekterek bi navê “Newfel” heye. Di Leyla û Mecnûna Gencewî û ya Sewadî da ev karekter di bin serenavê pênc sahneyan da derbas dibe.

Di vê gotarê da em ê berê bi kurtasî behsa jîyana her du helbestvanan bikin, çîroka Leyla û Mecnûnê bidin nasîn, paşê jî di her du berheman da karektera “newfel” û sahneyên karektera “newfel” çawa derbas dibe bikin û li gorî hûnandina çîrokê her du berheman berawird bikin. Di berawirdkirinê da emê hevbeşî û cudahîyên her du berheman li gorî azîna mikro analîzê tesbît bikin, bipîvin û binirxînin.

**Keywords:** Nîzamî, Siwadî, Leyla û Mecnûn, Newfel, Berawirdkirin.

### THE COMPARISON OF THE CHARACTER NAMED NEWFEL AND THE NEWFEL’S SCENES IN LEYLA AND MECNÛN STORY BY NÎZAMÎ AND SEWADÎ

Leyla and Mecnûn love story has gotten to kurdish literature by arabic and persian literature. This well-known story firstly was written in persian by Nizami Gencewi in the way of masnawi including more 4000 verses. After him some persian and kurd and turk poets have written this story in their languages in the masnawi way. Leyla and Mecnûn love story has been written in many languages like english, duetsh and russian, was well as has been translated. Therefore this story has become a world classic story. This story has been rewritten in a poetic way by some kurdish poets as well and handed as gift to kurdish literature, too. One of these poets is Sewadî who has written it in kurdmanci dialect. It is a fact that he was affected by Nizami. There are many similarities and differences between two



works. One of the common characters is Newfel for instance. This character seems within five chapters in both poets.

Through this article we will give knowledge about both poets's life and introduce Leyla and Mecnun story. After then the character Newfel will be analysed and compared in many terms of micro analyse.

**Key Words:** Nizamî, Siwadî, Leyla û Mecnûn, Newfel, Comparison.

## Destpêk

Çîrokên ku mijara wan evin û evîndarî ye gelek berfireh in û di nava edebîyata cîhanê da cihê wan gelek muhîm e. Çîrokên evîndarîyê cara ewil di nava edebîyata gelerî da hatine peydakirin û paşê ketine nav edebîyata nivîskî. Hinek ji wan çîrokan ji alîyê helbestvanan va bi qalibê qesîde û mesnewîyan hatine nivîsandinê. Mirov dikare çîrokên evîndarîyê weke du cure bi hesabîne yanê çîrokên evîndarîyê yê folklorik û yê nivîskî. Hêjmara wan çîrokan di edebiyata dunyayê da gelek zêde ne û weke çavkanîyên edebîyata klasîk jî tene hesabandinê.

Çîrokên evîndarîyê cara ewil di rojhilata navîn da bi terza mesnewîyê di edebiyata farisî da hatîye nivîsandinê. Di sedsala IX, X û XI yê zayînî da Rûdekî (m. 941) û Fîrdewsî (m. 1021) di nav berhemên xwe da cih dane çîrokên evîndarîyê. Li dû van kesan 'Unsûrî (m. 1040) û Fexreddîn Es'edî Kerkanî (m. 1055) mesnewîyên serbixw yê ku mijara wan evîndarî ye nivîsandine. Nîzamîyê Gencewî (m. 1214?) di sedsala XIIan da çîroka Xosrew û Şîrîn û ya Leyla û Mecnûnê bi zimanê farisî nivîsandîye. Bêgotin mirov dikare bibêje ew helbestvanên ku pîştî Nîzamî hatine û çîrokên evîndarîyê nivîsandine di bin tesîra wî da mane û rê û rêça wî şopandine.

Hetanî vê gavê hatîye tesbîtkirin ku bi edebiyata kurdî da 14deh mesnevîyên Leyla û Mecnûnê hatinê nivîsandinê<sup>1</sup>. Li gorî zaravayan me li jêrê navê nivîskar, berhem û dîroka nivîsandina wan daye.

Bi Zaravayê Hewramî penc mesnewî hatine nivîsandinê û ew jî vana ne:

1. Leyla û Mecnûna Mela Muhemed Quliyê Kendoleyî, sala nivîsandinê 1732.
2. Leyla û Mecnûna Xanayê Qubadî, sala nivîsandinê 1741.
3. Leyla û Mecnûna Mîrza Şefî'ê Kuliyaî, sala nivîsandinê 1834.

Abdurehman Adak (2014), "Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Mesnewiyên Leyla û Mecnûnê", *Kovara Wêje û Rexne*, Hejmar 3, r. 100, rr: 99-119.



4. Leyla û Mecnûna Mela Weledxan, sala nivîsandinê 1885.
5. Leyla û Mecnûna 'Ebdulqadir Debayan, sala nivîsandinê 1985.

Bi Zaravayê Kurmancî jî penc mesnewî hatine nivîsandinê û ew jî vana ne:

1. Leyla û Mecnûna Sewadî, Sala nivîsandinê 1758.
2. Leyla û Mecnûna Mela Mehmûdê Bayezîdî (pexşan e), sala nivîsandinê 1858.
3. Leyla û Mecnûna Şêx Mihemedcanê Aqtepe, sala nivîsandinê 1884.
4. Leyla û Mecnûna 'Hecî 'Ebdulfettahê Hezroyî, sala nivîsandinê 1975.
5. Leyla û Mecnûna Mela Muhemedê Hezanî, sala nivîsandinê 1982.

Bi Zaravayê Soranî çar mesnewî hatine nivîsandinê û ew jî vana ne:

1. Leyla û Mecnûna Mela Ferec Salih Şekîb, sala nivîsandinê 1942.
2. Leyla û Mecnûna 'Elî Kemal Bapîr, sala nivîsandinê 1950.
3. Leyla û Mecnûna 'Ebdulcebbar Axayî Kanî nivîsandinê 1969.
4. Leyla û Mecnûna Zarî, sala nivîsandinê 1976<sup>2</sup>.

Ji bo ku mijar baş were fêmkirin me hewce dît ku em di derheqê çîroka serpehatîya Leyla û Mecnunê da bi kurtasî hênek agahîyan bidin. Li gorî ku di çavkanîyan da derbas dibe bi gelemperî bûyer evha diqewume:

Çîroka Leyla û Mecnunê, çîrokeke gelerî û serpehatîyeke evînî ye û di edebiyata Îslamê da jî bûye mijara mesnewîyan. Li gor hin gotinan ev çîroka hanê çîrokeke rasteqînî ye<sup>3</sup> û lehengên wê jî lehengên rasteqînî ne. Çîrok di sedsala VIIan da di serdema Dewleta Emewîyan da di dema hukumdariya Merwan b. Hekemî (623-685) da li herêma Necdê qewimiye. Li gorî hinek rîwayetan Mecnûn, leqeba helbestvanê bi navê Qeys b. Mulewweha el-Amîrî (m. 698) ye û ev çîroka ji şîrovekirina helbestên wî derketiye. Leyla jî qîza Mehdî b. Saîd el-Emîrî ye.

Li gorî di çavkanîyan da derbas dibe bûyer bi vî rengî derbas bûye: Di çolên Necdê da ji êla Benu Amîr, Qeys û Leyla, di zaroktiya xwe da ji hev hez dikin. Xelkê devûdorê bi vê bûyerê dihese û gelek deng û behs tête kirin. Dayîka Leylayê ji ber ev gotinên nebaş, cezayê nederketina ji konî dide keça xwe Leylayê. Qeys, nikare yara xwe bibîne û ji ber hesreta nedîtina yarê, gelek xemgîn dibe, hiş û aqil ji serê wî diçin û derdikeve çol û çiyayan. Piştî demekê weke 'mecnûn'î yanê dîn tê binavkirin. Bavê Qeysî, bi derdê kurê xwe agahdar dibe

Parviz Jahany (2015), *Leyla û Mecnûna Sewadî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya<sup>2</sup>  
Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Mardîn, r. 29.  
Abdurehman Adak (2014), r. 100, rr: 99-119.<sup>3</sup>



û diçe ji malbata Leylayê wê ji kurê xwe ra dixwaze. Lê ji ber ku navê Qeysî weke mecnûn hatiye belavkirin, malbat, keça xwe nade wî. Bavê Qeysî, ji bo ku kurê wî şifayê bibîne, radibe wî dibe ser Ke'beyê. Lê Qeys li Ke'beyê bi armanca ku evîna wî xurttir bibe duayê dike ku nexweşiya wî hîn xedartir bibe. Xwedê duaya wî qebûl dike û nexweşiya wî her diçe zêde dibe. Bavê wî bi awayekî dilşewatî vedigere mala xwe û Mecnûn jî derdikeve çol û çiyayan û dibe hevalê heywanan. Yara wî Leyla jî dest bi nivîsandina helbestên evîndariyê dike. Mîrekî Ereban, bi navê Newfelî, helbestên wê bi dest dixê û dixwîne, dilê wî gelek pê dişewite û ji bo ku birîna wî bikewîne, radibe, diçe Leylayê ji bavê wê dixwaze. Mêze dike bavê Leylayê wê bi rindî nade, radibe leşkerên xwe kom dike û bi malbata Leylayê ra şerî dike.

Mecnûn, ewqas ji Leylayê hezdike ku naxwaze zirar bigêhêje devdora wê jî û ji bo ku malbata Leylayê di şerî da bi ser bikeve, duayê dike. Duaya wî tê qebûlkirin û Newfel bi ser nakeve. Lê ew bi vê rewşê şanaz nabe û careke din leşkeran kom dike, diçe ser malbata Leylayê û şerî dike. Vê carê bi ser dikeve, lê ji ber bi duaya ku Mecnûnî kiriye dihese, Leylayê nagire û lédixe diçe. Leyla bi mirovekî navê wî Îbn Selam e ra dizewicînin. Ji ber ku Leyla naxwaze bi Mecnûnî ra xiyanetê bike, ji mêrê xwe ra dibeje ku ji zaroktiya min da cinek bûye evîndarê min û ji min hez dike û eger tu destê xwe bidî minev cinê min, dê me herduyan jî bikuje. Bi vî awayî mêrê xwe dixapîne û ji xwe dide dîrxistin. Piştî demekê, bi duayên Mecnûnî, mêrê Leylayê dimire. Ji ber ku Leyla azad dibe, radibe diçe çolan, li Mecnûnî digere û wî dibîne, lê ji ber ku Mecnûn, wê nasnake û naxwaze xwe bigîhîne wê wîsal çênabe. Lewra, Mecnûnî təkiliya xwe ji dinyayê qut kiriye û ji ber 'eşqa îlahî, dîn û har bûye. Leyla, bêhêvî ji cem wî vedigere û demeke di nav derd û kulan da jiyana xwe berdewam dike û dimire. Dema Mecnûn ev xebera bidilsoj dibihîze, direve, diçe ser gora Leylayê û ji Xwedê rica û dexaletê dike ku ruhê wî jî li wê derê bistîne. Xwedê, duaya wî qebûl dike û ruhê wî distîne û Mecnûn hetanî ruhê xwe radestdike, navê Leylayê, ji ser zar û zimanê xwe naxe<sup>4</sup>.

## 1. Kurtejiyan û Berhemên Nîzamêyê Gencewî

Ji bo ku berawirdkirin baş were têgihîştin hewceye em her du helbestvanan û berhemên wan bidin nasîn.

### 1.1. Kurtejiyan Nîzamêyê Gencewî

Nesim SÖNMEZ (2018), *Dîwana Şêx Muşerrefê Xînuî -Metn&Lêkolîn-* Weşanên Weşanxana Seyda, Çapa 4 Yekem, Diyarbakır, r. 129-130.



Di derbarê dîroka ji dayîk bûn û mirina Nîzamîyê Gencewî da agahîyên teqez tune ne. Her weha agahîyên ku di tezkîreyan da derbas dibin û yê lêkolînên modern jî têrê nakin. Agahîyên ku di derheqê jîyana wî da hatine dayîn her çiqas pir hindik bin jî ji berhemên wî hatine wergirtin. Li gorî raya giştî di sala 535/1141ê da hatîyê dinyayê û UNESCO jî ev dîrok pejirandîye û sala 1991ê weke sala 850mînê ji dayîkbûna Gencewî îlan kirîye. Bavê wî Tirk e û dayîka wî jî Kurd e, bavê wî jî bajarê Qumê koç dike diçe Gencê û Nîzamî jî li wir tê dinyayê. Nîzamî perwerdehîyek baş dibine, di gel ziman û edebîyatê astronomî, felsefe, coğrafya, tip û matematîkê jî dixûne û hînî gelek zimanan weke Farisî, Erebi, Pehlewî, Suryanî, Îbranî, Ermenî, Gurcî û hwd dibe.

Gencewî, piştî ku perwewerdehîya xwe diqedîne naxwaze karê dewletê bike û dest bi nivîsandina helbestan dike. Wan helbestên ku dinivîsîne ji rêvebirên dewletê ra bi rê dike, ew jî ji Gencewîra pare dişînin. Gencewî bi vî rengî debara xwe berdewam dike. Her çiqas Nîzamî ji serokkomarên dema xwe ra helbest birê kiribe jî ew ne helbestvanek koşka mîran ne. Wî jîyanek mutewazî derbas kirîye.

Gencewî teqez nebe jî di sala 611/1214an da li bajarê Gencê emrê Xwedê bi cih tîne û li heman bajarî tê definkirin.

## 1.2. Berhemên Nîzamîyê Gencewî

Îro ji berhemên Nîzamî yek tenê gihêştîye roja me û navê wî jî Xemse ye û bi navê “Pênc Genc” jî tê naskirin. Berhem kê-m-zêde 35 hezar malik e û di navbera sih û pec-çil salî da hatîye qedandinê. Texmîs di edebiyata farisî da di warê cureya texmîsê da cureya herî serkeftî ye. Helbestvanên weke Emîr Husrevê Dehlewî (m. 725/1325), Şemseddîn Katîbî Nîşabûrî (m. 839/1435 [?]), Mela Abdurrahmanê Camî (m. 536/1141) û hwd li ser berhemê nazîre nivîsandine. Di gelek pirtûkxanan da destxetên berhemê hene û li Îranê, Hindîstanê û Avrûpayê jî gelek caran hatîye çapkirin.

Mesnewîyên ku di Xemseyêda ne evana nin:

1. Mahzenu'l-Esrar: Berhem 2400 sed malike û li ser navê ji Mîrektîyan Mengûcûkûyan Mîrê Erzîncanê Mîr Fexreddîn Behram Şah di sala 570/1174 an jî 572/1176an da hatîye nivîsandinê.

2. Xosrew û Şîrîn: Li ser dîroka nivîsandina berhemê û helbestvanê wî hevdengîyek tune ye. Li gorî hinek agahîyan di sala 576/1180-81an da hatîye qedandinê û li gor nuxseyan 5700-



7700 malik e. Di mesnewîyê da çîroka serpehatîya evîndarîya hukumdarê Sasanîyan Xosrewê Perwîz û prensesê ermenî Şîrînê hatîye hûnandin.

3. Leyla û Mecnûn: Mesnewî di sala 584/1188an da hatîye nivîsandinê û li devdora 5000 malikan e. Ev mesnewî mijara meye û em dût û dirêj li ser disekin.

4. Heft Peyker (Behramname): Mesnewî di sala 593/1197an da li ser daxwaza Mîrê Meragê Korpearslanê hatîye nivîsandin û ji bo wî hatîye dîyarîkirin.

5. Îskendername: Mesnewî ji du beşan pêk tê, beşa ewil bi navê “Şerefname”yê di sala 597/1201ê da û beşa duduyan jî piştî sala 607/1211an bi navê “Îqbalname”yê hatîye nivîsandinê. Beşa yekem 10 hezar malike û beşa duyem jî 3700 malik e.

Di hinek çavkanîyan da derbas dibe ku dîwanek Nîzamê Gencewî heye û 20 hezar malik e û têda qesîde, xezel, terkîbîbend, tercîbîbend, rubaî û yekmalik hene. Lê hetanî vê gavê nusxeyek ji dîwanê nehatîye bidestxistin<sup>5</sup>.

## 2. Kurtejiyana Sewadî

Sewadî, yek ji helbestvanên edebiyata kurdî ya klasik e lê hetanî vê gavê di derheqê jîyana wî da agahîyên teqez nehatine bi dest xistin. Ew, di nava kurdan da weke Harisê Bitlîsî<sup>6</sup> û Xarisê Bitlîsî<sup>7</sup> hatîye nasandin. Lê helbestvan di helbestên xwe da xwe weke “Sewadî” bi nav dike. Ev jî tê vê maneyê ku “Sewadî” navê helbestvan nîne û wî ev nav ji xwe ra weke mexles bi kar anîye. Sewadî di berhema xwe ya bi navê Layla û Mecnûnê da peyva “Sewadî bi kar tîne:

*Ya Rebbî Sewadiyê cegerxûn*

*Azad bikey bibexşî Mecnûn<sup>8</sup>*

Dîroka ji dayîkbûna Sewadî zelal nîne lê wî di Leyla û Mecnûna xwe da malikek nivîsandîye ku li gorî hesabê ebcedê dema ev malik tê hesabkirinê derdikeve ku berhem di sala 1172/1759an da hatîye nivîsandinê. Li gorî destxetan di vê malike da hinek gurtin hene<sup>9</sup>.

Ev agahîya hanê jî nişan dide ku Sewadî di sedsala XVIIIan da jîyaye. Ew makîk jî e va ye:

*Me'xzê dev û lêv û se'yê sinn e*

Mehmet Kanar (2007), “Nizamî Gencevî”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, Weşanên Türkiye Diyanet Vakfı, <sup>5</sup> İstanbul, XXXIII, r. 183-185.

Tehsîn İbrahim Dosikî (2004), *Leyla û Mecnûn*, Weşanên Sipîrêz, Duhok, r. 5-18; Marûf Xeznedar (2010), <sup>6</sup> *Mêjûy Edebî Kurdî*, I-VII, Dezgay Aras, Hewlêr, II, 507.

Qanatê Kurdo (1983), *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Weşanên Öz-Ge, Çapa 2yan, r. 122.<sup>7</sup>

Siwadî (1999), *Leyla û Mecnûn*, (Tîpderbasîya Latînî: M. Reşîr Irgat), Weşanên Nûbiharê, Çapa 1em İstanbul, <sup>8</sup> r. 195, malika 766an; Ev malik di hemû nusxeyên Leyla û Mecnûnê da derbas dibin.

Binêrin, Siwadî (1999), r. 42-43; Hacî Firoz, *Leyla û Mecnûn*, Destnivîsa Pirtûkxana Petresburgê, v. 11. <sup>9</sup>



## *Tarîx ji wê lew ji me'xzê sinn*

*e*<sup>10</sup>

### **2.1. Berhemên Sewadî**

Hetanî vê gavê bi qasî ku hatîye tesbîtkirin du berhemên Sewadî hene û ew jî vanê jêrê ne:

#### **2.1.1. Leyla û Mecnûn**

Berhema Sewadî ya ku herî zêde tê naskirinê Leyla û Mecnun e. Sewadî berhema xwe bi terza mesnewîyê, bi zaravayê kurmançî bi kêşeya 'erûzê û bi behra hezecê nivîsandîye. Berhem jî 25 beşan<sup>11</sup> û jî 779an pêk hatîye. Helbestvan li gorî tradisyona mesnewîyan bi munaceatê û bi van malikan dest pê dike:

*Fêhristê kitabê navê Me'bud  
Qeyyûm û qedîm û hey û mewcûd*

*Bêşibh û misal û 'edl û xaliq  
Sazindeyê mumkinat û faliq<sup>12</sup>*

Berhema Sewadî bi van malikên jêr jî diqede:

*Mewta mi heqq e û newêrim  
Lewra gunê ecêb didêrim*

*Rakî li mi key we min riha key  
Bo xatirê alê Mustefa key<sup>13</sup>*

#### **2.1.2. Helbestên Sewadî**

Ji berhemnê Sewadî yek jî qesîdeyên wî ne. Di çavkanîyanda du qesîde weke yên wî derbas dibin. Li mirov bi teqez nikare bibêje her du qesîde jî yên Sewadî ne. Ji wana yek ev qesîde ye ku lêkolîner bi piranî weke qesîda wî qebûl dikin. Qesîde her çiqas li gorî nusxeyan were guhertin jî li gorî Dîwan Camî' 16 malik e. Ew qesîde bi van malikan despê dike:

*Ey felek dîsa te kul kir, derd û êşanê di min*

Tehsîn Îbrahîm Doskî (2004), r. 42<sup>10</sup>

Abdurrahman Adak (), "Analîzeke Kodîkolojîk lî Ser Leyla û Mecnûnên Sewadî, Bazîdî û fuzûlî dî<sup>11</sup>  
Koleksiyona A. Jaba ya Destnivîsên Kurdî de", *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, Ağustos-2018 Cilt:10 Sayı:3 (21), rr: 1197-1222, r. 1212.

Siwadî (1999), r. 10-11; Tehsîn Îbrahîm Doskî (2004), r. 25<sup>12</sup>

Siwadî (1999), r. 196-197; Tehsîn Îbrahîm Doskî (2004), r. 139.<sup>13</sup>



*Mislê bulbul meylê gul kir, zar û efxanê di min*

*Şerbeta lefz û kelaman, wê di nêv tasa û caman*

*Dane cumle xass û ‘aman, cam û fincanê di min*

Û bi van malikên jêrê jî dîqede û di malika ewil da mexlesa xwe weke “*Sewadî*”, di ya dawîyê da jî weke “*Suweyda*” bi kar anîye:

*Ey Sewadî bes bibêje, qisseta ‘êşqê dirêje*

*Berf û baranê dirrêje, ebrê nîsanê di min*

*Ey Suweyda her digotî, qelb û dil herdem disotî*

*Şibhetê narê kevotî, reis û e’iyanê di min<sup>14</sup>*

Qesîdeya duduyan jî bi rengê çarînan hatîye hûnandin û ji 15 çarînan pêk tê. Li gorî lêkolîneran ev qesîde ya Sewadî nîne lê bi çewtî weke ya wî hatîye binav kirin. Qesîde evha destpê dike:

*‘Ehdê qedîm hate bîr*

*Nalîn ji min tèn bêqiyas*

*Mayîm di hebsê da esîr*

*Mêhra dilêm muhkem esas*

*Mêhra dilêm zor qayîm e*

*Aşiq ji lewmê laim e*

*Lewmê bikin sed laime*

*Xem nakişî ji nasir nu’has*

### 3. Berawirdkirina Karektera Newfel û Sehneyên Newfelî

Di sepêhatîya çîroka Leyla û Mecnûnê da karektera Newfel, karekterek gelek muhîm e û tesîra kesayeta wî di berhema Nîzamî û ya Sewadî da paralel dimeşe<sup>15</sup>. Di berhema Nîzamî da cihên ku Newfel dikeve nav çîrokê di bin çar serenavan da û di berhema Sewadîda jî di bin serenavîke da hatîye hûnandin.

Di berhema Nîzamî da karektera Newfel bi van serenavan hatîye hûnandinê:

Ji bo tevahîyê qesîdeyê binerîn: Mela Ehmed Hilmî, el-Qoxî (2004), *Dîwana Camî*, Îhsan Yayınları, İstanbul, <sup>14</sup> r. 381-382.

Di vê gotarê da ji bona berawirdkirina karektera Newfel, ev berhem weke bingeh hatine girtin: Hasan Vahid <sup>15</sup> Destgerdî (1386), *Hakîm Nîzâmê Gencewî Leyla û Mecnûn*, Neşrî Qatre, Tehran; Siwadî (1999), *Leyla û Mecnûn*, (Tîpderbasîya Latînî: M. Reşîr Irgat), Weşanên Nûbiharê, Çapa 1em İstanbul.





- ❖ Newfel tête bal Mecnûnî
- ❖ Şerê Newfelî ye dijî hoza bavê Leylayê
- ❖ Mecnûn dijî Newfelî diaxive
- ❖ Newfel bo cara düyê diçîte şerê bavê Leylayê

Di berhema Sewadî da karektera Newfel bi yek serenavê hatîye hûnandinê û ew jî ev serenavê li jêrî ye:

- Ceng û cîdala Newfel e digel İbnu Selamî ji bo Mecnûnê belengazê bê cî û bê meqamî

Di her du berheman da hejmara serenavên ku Newfel li ser sehnê ye wekhev nînin. Di berhema Nîzamî da mijar di bin çar serenavan da derbas dibe lê di berhema Sewadî da di bin serenavêkî da derbas dibe. Cudahîya hejmara sernavan jî dide xwîyakirin ku di terz û rêbaza her du helbestvanan da hinek cudahî hene. Bo nimûne Sewadî di berhema xwe da gava nav li beşê dike naxwaze di bin çend serenavan da mijarê binirxîne lê Nîzamî bi hûrgulî serenavan datîne û bi berfirehî mijarê dinirxîne.

Di berhema Nîzamî da ketina Newfelî nava çîrokê bi temamî tesadufî ye. Newfel, Mecnûnê li çolê weke kesek reben, porê wî li ser serê wî bûye gijik, derdkêş, rût û tazî, pêxwas, ji mirovan kûvî, li ber kevir û kuçikan e û bûye hevalê heywanên wehşî dibîne (103/12-14-15-16)<sup>16</sup>. Dixwaze Mecnûnê nasbike û jê dipirse dibêje tu kî yî? Mecnûn dema bersiva Newfel dide, ew hîndibe ku Mecnûn ji ber evîna keça ku ji roj û hîvê bedewtir e din û har bûye û bi roj û şevan helbestan dinivîsîne (104/1-2-3-4). Dema ku Newfel bi vê rewşê dihesse biryar dide ku vê evîndarê xemxur bigîhîne evîna wî (104/10-11). Ji hespê xwe peya dibe, gazî Mecnûnê dike, bi hev ra li ser sifrê rûdinin dixun û vedixun û xezelan dibêjin. Di vê sohbetê da Newfel hîndibe ku Mecnûn bê Leylayê naxwe-venaxwe, qise nake û helbestan naxûne. Newfel di nav axaftina xwe da bi tenê qala Leylayê dike û dixwaze wî kêfxweş bike (104/12-13, 105/1-2-3-4-5). Newfel ber dilê Mecnûnê dide û jê dixwaze ku ew bi aram be û dev ji şîn û gîrîyê berde û soz dide ku hetanî Leylayê neke jina wî dev ji vî karî bernade (106/10-11-12-13-14-15):

Ta hemseri to negerded an mah

Ez wîy nekonem kemend kutah

(105/12)

Mînakên ku ji Mesnewîya Nîzamî û Sewadî hatine dayîn di nava kevanekê da hejmara yekem ya rûpelê ye û <sup>16</sup> yên din jî hejmara malikan in.



Mecnûn bawerîya xwe bi gotina Newfel tîne, daxaza wî qebûl dike, terka çol û çîyan dike û diçe li cem Newfel dimîne. Ser û goyê Mecnûnê tê şuştin û ev ji kêfan dest bi xarin û vexarinê dike. Bi alîkarîya Newfel, Mecnûn dev ji dîntîyê berdide û dest bi jîyaneke aramî dîke (107 / 2-3-5-6-10-11-15-16-17).

Di berhema Sewadî da haya Newfel ji kesek bi navê Mecnûnî heye û dixwaze di derheqê wî da hinek agahîyan bi destên xwe bixîne. Newfel, mîrek xwedan lele û wezîr û leşkeran e, fermana wî li her derê tête qebûl kirin. Ew; mirovek serwest, zana, bi merhemet û xwedan pileyek bilind û dîwaneke ye. Bi navê Asef wezîrek wî heye ku ew kesek dilpak, rewşenbîr û zana ye. Newfel rojek di dîwana xwe da ji wezîrê xwe yê dilpak dipirse dibêje ez dixwazim di derheqê “Mecnûnî ku qala wî tê kirin ew kîye û çîroka wî çî ye” da hinek agahîyan bi dest bixim.

Wezîr, dema bi hûrgilî çîroka Mecnûnê ji Newfel ra dibêje, ew bi vî bûyera dilsoj gelek xemgîn dibe û fermanek li axa û begên xwe belav dike û dibêje amade bibin em subê diçin deşt û çîyan seyranê dikin. Axa, beg, serbaz û leşker amade dibin û bi hev ra diçin deşt û çîyan seyr û geştê dikin û di dawîyê da Mecnûnî rebenî belengaz dibinin.

Dema Mecnûnî dibinin çî bibînin ew, di rewşek gelek xerab da ye, rût û tazî ye, axîn û nalîna wî ye. Ew ji hespên xwe peya dibin bi dilnêrmî û dilemînî wî li hembêz dikin, cil û bergên nû lê dikin û bi şahî û kêfxweşî wî jî digrin û vedigerin malê. Lê di rê da ji ber axîn, oxîn û zarîna Mecnûnî bêzar dibin. Nîhayet wî digîhînin malê, ser û goyên wî dişon, taximek cil û bergên xweşik lê dikin, merhemê li ser birînên wî didin û cur be cur xarin û vexwarinên xweş jê ra çê dikin (123-127/454-478).

*Dîtin bi tenê ku 'ûr û tazî*

*Bed'hal û bi ah û zar û gazî (125/467)*

*Poşîde kirin bi lubs û cam e*

*Hilgirtine pêş xwe şadikam e (127/471)*

Lehengê Nîzamî, yanê Newfel bi tesadufî Mecnûnê dibîne, lê agahîya lehengê Sewadî, yanê Newfel ji Mecnûnê heye.

Nîzamî ji bo ku Newfel têxe nava çîrokê hewcedarîyek bi pêxistina çîrokê nabîne û rasterast Newfel dixîne nava çîrokê. Sewadî, bere ku lehengê xwe têxe nava çîrokê di derhêqê wî da hinek agahîyan û pesnên wî dide. Ew bi vî rengî sedemê ketina Newfelî nava çîrokê bi sedemeke aqîlane va girê dide û bi terzek e maqûlî va şîrove dike. Sewadî bi vî şeklî sedem û



encama çîrokê di çarçoveya hunera çîrokan da pêk tîne. Nîzamî hewcedarîya xwe bi narînî, nazîkî û zerafetek bi vî rengî nayîne.

Nîzamî, di serê sahneya ku Newfel têda derbas dibe di hûnandina çîrokê da wî weke kesek dixwaze xuy û xisletê Mecnûnî biguherîne û wî vegeerîne jîyaneke normal dide nasandinê û bi vî rengî dixwaze tesîra Newfel li ser Mecnûnî di serî da bide nişandan. Sewadî jî di serê sahneya ku Newfel têda derbas dibe di hûnandina çîrokê da dixwazde eşkere bike ku ji bona guherandina xuy û xisletê Mecnûnî, Newfel nikare tu tesîrek li ser wî bike. Ew ji bo ku vê armanca xwe baş bide nişandan dibêje guherandina exlaqê wî li alîkî ew ji Newfel û axa û beğen wî ra çêran û pirsan dike.

Nizamî çîrokê evha dide berdewamkirin: Rojeke Newfel û Mecnûn li cem hev rûdinin û bi kêfxweşî bi hev ra qise dikin. Mecnûn 2-3 xezelên evîndarîyê dixwîne (108/4-5) û ji Newfel ra dibêje te ez xapandim anîm van deran, hewceye di demeke kurt da tu soza xwe bi cih bînî û biçî Leylayê j imin ra bînî. Eger tu neyînî ezê cara duduyan derkevim serê çol û çîyan. Lewra jîyan bê Leylayê nabe (108 / 7-9-10) û tu nebûyî melhema dile min ê birîndar. Êdî ne mumkûn e ez sebir bikim, dûrbûna jî evîndarê tîbûna min zêdetîr dike. Lewra Leyla ji bona min ava heyatê ye (108 / 11-12-15-16):

*Sed zexmi zeban şenîdem ez to  
Yek merhemî dil nedîdem ez to (108/11)*

*Sabrem şod û 'aql rixt berbest  
Deryâb wegerne reftem ezdest (108/12)*

*Bîyâr menem za 'îf û rencûr  
Çun teşne zeabi zendegî dûr (108/16)*

Di berhema Sewadî da ev sehne bi vî rengî didome. Mecnûn qîma xwe bi wan tiştên ku Newfel jê ra dîyarî kirîye nayîne, ji wî ra spas nake û bi serda jî ji wî ra çêr û pirsan dike û qîlfê xwe bi wî dike û wî rezil û riswa dike. Dibêje hewcedarîya min bi mal û milkê dunê tune ye ez Leyla ya xwe dixwazim (127-129/ 476-479):

*Ruswayî dikir wî mîrê Newfel  
Şermende dikir di nêv mehfel (127/477)*

*Navê mi te'am û came xil'et*



*Leyla mi divê çî kem bi sil'et* (127/478)

Di berhema her du helbestvanan da jî helwesta Newfel di pêvajoya çîrokê da paralel didome. Lê di hal û hereketên Mecnûnî da hinek cudahî hene. Bo nimûne di berhema Nîzamî da Mecnun ji demê gazindeyan dike û ji Newfel dixwaze ku ew hinek bilez tevbigere û bê aramîya xwe nişan dide. Di berhema Sewadî da Mecnûn gazindeyan ji demê nake, tenê ji Newfel dixwaze ku here Mecnûnê jê ra bîne.

Him di berhema Nîzamî da him jî di berhema Sewadî da Mecnûn heman bertekê nîşanî Newfel dide. Lewra Mecnûn hîna destên xwe ji dunyayê berneda ye û di navbera eşqa mecazî û eşqa îlahî da diçe û tê.

Di berhema Nîzamî da Newfel ji ber gilî û gazindeyên Mecnûnî weke rûnê li ser agir di perite û dihele. Ji nişkva ji cihê xwe radibe, şûrê xwe dixwe destê xwe, ji bona şer amadehîyan dike û weke şêrê reşê şerxwez dikeve rê (109 / 2-5). Bi qwasidê xwe ra ji malbata Leylayê ra xeberê dişîne û dibêje bila Leylayê bi rindî bişînin eger neşînin ezê bi çoyê zorê Leylayi bibim ji Mecnûnî ra (109/6-9). Malbata Leylayê bi van gotinan gelek aciz dibin ji Newfel ra bersivek evha bi rê dikin: “Leyla ne kadeya nava rûn e ew, heyva ser asîmanan e. Bi darê zorê birina wê mîhrîmahê ne heddê te ye û ne jî heddê heftê û heft bavê te ye. Ew weke roj e, tu wê kuda dibî, tu şeytanê kevirkirî yî, ew stêrka birqonek e, ger tu şûr ji qalîk bikişîni emê jî bikişînin...”:

*Dâdend cevâb kîn nerâhest*

*Leylî negulîçe, kursi mâhest* (109/12)

*Kes râ sûyi mâh destres nîst*

*Na kâri to, kâri hîçkes nîst* (109/13)

*Û râ çî berî ki âfitâb est*

*To dîwo recîm u û şihâb est* (109/14)

Dema qasid vedigere û bersiva malbata Leylayê ji Newfel ra dibêje, Nefel bi van xeberan gelek aciz dibe û dubare xeberê ji wan ra dişîne lê ev car jî bersivek neyênî digire. Nefel, gelek hêrs dibe, ew û leşkerên wî şûrên xwe ji qalîkan derdixînin û êrişî ser konên malbata Leylayê dikin (109/16, 110/1-6). Şervanên malbata Leylayê jî dikin qîrîn û qajîn şûrên xwe digirin û êrişî Nefel û leşkerên wî dikin. Newfel, di şer da têk diçe (110/7-17). Li meydana şer herkes şer dike lê Mecnun destên xwe bilind dike ji bona malbata Leylayê bi ser bikeve dua dike. Leşkerek vê halê wî dibîne û tê cem jê ra dibêje “ ev çihal e em ji bona te şer



dikin û canê xwe ji dest didin û tu ji bona ku dujmin bi ser bikeve dua dikî?”. Mecnun dibêje li her derê bîhna Leylayê tê pozê min, ez çawa neçim alîyê malbata evîna xwe (111/1-14, 112/4-12).

Newfel weke filek serxwoş erîş dibe ser dujmin û wana tar û mar dike. Her der dibe gola xwûnê, dema roj tiçe avan û dibe êvar herkes vedikişê herêma xwe (113/1-7). Dora rojê dema Newfel û leşkerên wî ber bi malbata Leylayê diçin çî bibîn malbat amade bûye û li benda wan e. Newfel têdigêhêje ku çareser kirina pîrsgirêkê tenê bi rêya aşîtiyê dibe û qasidek ji malbata Leylayê ra dişine û dibêje ez ne ji bona şer, ji bona aşîtiyê hatime û ne evîndarê şer û pevçûnê me. Li ser vê pêşniyazê her du serî jî aşîtiyê qebûl dikin û li hev tên (113/8-17, 114/1-5):

*Engîht mîyâncî ze xuyîşân*  
*Tâ sulh dehed miyâni îşân (113/13)*

Di berhema Sewadî da jî gilî û gazindeyên Mecnûnî tesîrek gelek mezin li ser Newfel çêdike û ew her tiştî ji bîr dike û tenê bi mesela Mecnûnî ra eleqeder dibe. Newfel rûsipîyek xwe amade dike û dişine mala bavê Leylayê. Ev rûsipî jî komek mirovên bijarte amade dike û bi hev ra diçine çîyayê Necdê û xwe digîhînin konê bavê Leylayê û li ber dere kon peya dibin. Ji bavê Leylayê ra daxwaza mîrên xwe evha dibêjin: “Ey Mîrê Xweşbext! Mîrê me Newfel keça te Leylayê ji ji bo Mecnûnî dixwaze, eger tu bibêjî erê emê ji bo te gelek mal, milk, zêr û zîvan berhevbikin û dîyarîyî te bikin”. Mîrê ereban kûr û dûr difikire û bersiva wan dide û dibêje: “ev daxwaz ne daxwazek erêbûnê ye, ne mumkûne kû ez keça xwe bidim. Biçin ji mîrê xwe ra bibêjin ew mîrek payebilind e, mezin e, xwedan edet û toreyan e, ew Mecnûnî dînikê ku zincîr di gerdena wî da heye û hetanî vê gavê tu dermanek ji derdê wî ra nehatîye dîtin ez dê çawa keça xwe ya mîhrîmah bidimê. Bila mîrê we vê meselê qet hilnede û daneyne, riza min bi vê karî tune ye û ji sedî sed jî nabe.”

Rûsipî û hevalên xwe vedigerin cem Newfel û gotinên bavê Leylayê yek bi yek jê ra dibêjin. Gava Newfel van gotinan dibîhîze kêfa wî gelek direve û gazî serbaz û leşkerên xwe dike û fermanek evha dide wan: “gelî pehewan û cengawerên min ji bona subê amade bibin em diçin cengê.”

*Qasid vegeraye canibê mîr*



*Yek yek xeberê wî kirine teqrîr (131/491)*

*Weqtê wehe gotin ev cewabe*

*Mîr hate tehewur û 'etabe (131/492)*

*Gazî kire cundî û lewendan*

*Sahibhuneran û gürz û bendan (113/493)*

Dema ku bavê Leylayê vê hewariyê dibîhîse ew jî hinek amadehiyan ji bona şer dike. Her du alî jî tîne hemberî hev şûr û tîr û kevanên xwe dikişînin û dest bi şer dikin. Di şer da gelek kes tîne kuştin û xwînek mezin diherike. Di dawîya şer da Newfel bi ser dikeve û bavê Leylayê têk diçe. Çawa di berhema Nîzamî da derbas dibe Mecnûn di pêvajoya şer da desten xwe bilind dike û ji bo serkeftina bavê yara xwe dua dike (135/ 507-509). Xwedê duayê wî qebûl dike û şer radiweste lê bavê Leylayê, Mecnûnî dîl digire li lû dûv xwe kaş dike û dibe dixwaze wî bikuje. Hinek kes nahêlin wî bikuje lê weke esîrek wî dibin. Dora rojê şer dîsan destpê dike û bavê Leylayê mêze dike serkeftin nemumkûn e daxwaza aşîtiyê li Newfel dike û dibêje “eger tu aşîtiyê qebûl nekî emê Mecnûnî bikujin.” Newfel ji dilê xwe yê saf û ji neçariyê vê daxazê qebûl dike û dibêje “bi wî şertê ku hûnê Mecnûnî azad bikin û bidin me û bila Leyla jî ji we ra be.”

*Wan gotine Newfelê be ala*

*Ger sulhê nekey digel me hala (135/514)*

*Em dê bikujin li êre Mecnûn*

*Ew ba 'isê fitne beytê meftûn (137/512)*

*Leyla ji we ra wî jî reha ken*

*Çawan we divê emê wisa ken (137/517)*

Di berhema Nîzamî da dema cara duduyan newfel êrişê dibe ser leşkerên bavê Leylayê malbata bavê Leylayê dibinin ku şer nexwastin ne mumkûn e ew jî dest bi şer dikin. Şer gelek gur dibe û Newfel bi hêzek awarte şer dike (116/1-14). Di dawiyê da Newfel bi ser dikeve û rûsipiyên malbata Leylayê aşîtiyê dixwazin (117 / 9-14). Newfel dibêje bi şertê ku hûn Leylayê bînin ezê aşîtiyê qebul bikim. Dema bavê Leylayê van gotinan dibîhîze gelek xemgîn dibe û tê cem Newfel evha dibêje: “ Tu kesek cengawer û comerdî, hêvîdar im ku ya hatiye serê min neyê serê te. Sedemê vî şerî û rijandina xwînê ez im, ez gelek şermezar im. Ger tu

keça min bigirî bidî koleyekî jî ez deng nakim (117/6-13). Lê ev Mecnûnê ku li çol û çîyan digere qîza min xistîye nava dev û didanan hetanî didim wî bila bimire baştir e (119/3-13). Heta ku ez qîza xwe didim Mecnûnî, serê wî jê bikim bavêjim ber kûçikan çêtir e (120/1-5). Ji ber van gotinan Newfel dev ji Leylayê berdide û şunda vedikişê (120/13-15, 121/1-8). Li ser vê biryarê dile Mecnûnî dişkê, ew di xeyîde û cardin vedigere çol û çîyan (121/9-15, 122/1-4).

Nîzamî radigîhînre ku Newfel ji ber ku di şer da daxaza aşîtîyê qebûl dibe Mecnûn jê dixeyîde û wî weke kesek piçûk dibine (114 / 6-10). Di berhema Sewadî da ev sahne tune ne.

### Encam

Di berawirdkirina mesnewîya Leyla û Mecnûna Nîzamî û Sewadî da kesayeta “Newfel” û beşa ku tesîra kesayeta wî li ser çêbûye da ev encam hatine derxistin:

Sewadî pevxistina çîrokê ji Nîzamî girtîye. Lê belê wî çîrok li gorî rê û rêbaza xwe vehûnandîye û him ji alîyê lehengan va him jî ji alîyê vegotina çîrokê va pevxistinek orjînal derxistîye meydane.

Nîzamî, Newfel ji Mecnûnî ra him kesek weke dost daye nişandan him jî kesayetek şervan, bi hêz û rexnegir daye nasandin. Nîzamî, çîrok li ser Newfel nehûnandîye û li ser lehengê eslî yanê Mecnûnî hûnandîye û Newfel weke kesek alîkarê Mecnûnî daye nişandan.

Sewadî, Newfel weke kesek alîkarê Mecnûnî daye nişandan. Newfel him xêrxwaz e him jî şervan û pehewan e. Newfel lehengê eslî nîne belkî karekterek alîkar e.

Nîzamî xwestîye ku çîroka xwe li navenda lehengê xwe yê eslî bihûne, lê Sewadî tiştêk bi vî rengî nefikirîye, lewra ew dizane ku çîrok berya wî ji alîyê gelek şairan va hatîye nivîsandin. Wî xwestîye ku vê çîrokê bi uslûba xwe û bi terza lîrikî binivîsîne.

Sewadî dema metna xwe nivîsandîye hinek çaran ji rêbaza Nîzamî derketîye, hinek cudahî û çêkirine û xwestîye metnek resen bîne holê. Terza Sewadî ji bilî di wan cihên ku têda guhertin çêkirîye di hûnandina çîrokê da dişibihe terza Nîzamî. Hêjmarên malikên Leyla û Mecnûna Sewadî gelek ji ya Nîzamî kêmtirin.

Di her du berheman da jî şerê ku di navbera bavê Leylayê û Newfel da derdikeve piştî ku Newfel qasid dişîne mala bavê Leylayê û wê ji Mecnûnî ra dixawze dest pê dibe. Lê di navbera her du berheman da wekhêvîyek tune ye. Di Leyla û Mecnûna Sewadî da leşkerên bavê Leylayê têk diçin lê ew firsendek dibinin û Mecnûnê dil digirin. Piştî dilgirtina Mecnûnê jî Newfel daxwaza aşîtîyê dikin û jê ra dibêjin “eger tu bi aşîtîyê razî nebî em ê Mecnûnê bikujin.” Newfel ji bo ku Mecnûnê ji talûka kuştinê xelas bike û wî azat bike mejbûr dimîne ku leşkerên xwe şunda vekişîne û aşîtîyê qebûl bike. Lê di Leyla û Mecnûna Nîzamî da cara ewil bîlaks leşkerên Newfel têk diçin û Newfel daxwaza aşîtîyê li bavê Leylayê dibe.



Di berhema Nîzamî da di navbera bavê Leylayê û Newfel da du çaran şer diqewime. Di cara duduyan da orduya bavê Leylayê têk diçe. Li ser vê encamê bi armanca ku aboriya wan di nava ereban da têk nece bavê Leylayê ji Newfel daxwaz dike ku daxaza keça wî ji bo Mecnûnê neke. Bavê Leylayê dixwaze qîza xwe bide koleyê Newfel yê herî bêqîmet lê nede Mecnûnê dîne serê çol û çîyan. Rûsipîyên Newfel jî dibin palpiştê daxwaza bavê Leylayê û bi armanca ku feydeyekê bigêhêje Mecnûnê şer didin rawestandinê. Lê di vê sehneyê da Sewadî evha nabêje. Lewra Newfel ji bo ku Leylayê ji Mecnûnê ra bîne şer dike û gelek xwîna xortan dirijîne çawa dilê wî bi gotina bavê Leylayê nerm dibe û dev ji armanca xwe berdide û Mecnûnê weke şerpeze li meydanê dihêle.

Di her du berhemanda jî Newfel mirovek e xwedanhez e, dixwaze alîkarîya Mecnûnê bike û bi bavê Mecnûnê ra şer dike. Lê nikare Leylayê ji bavê wê bigre û bide Mecnûnê.

Di her du berhemanda jî Mecnûn xezalekê ji dafika nêçîrvanekî rizgar dike lê di rizgarkirina xezalê da rêya her du helbestvanan wek hev nîne. Di Leyla û Mecnûna Sewadî da Mecnûn lavayî nêçîrvan dike û jê ra dibêje çavên xezalê weke çavên Mecnûnê ne, wê azad bike û bibexşîne min. Dilê nêçîrvan bi Mecnûnê dişewite û xezalê azad dike û dîyarîyî wî dike. Di berhema Nîzamî da nêçîrvan ji Mecnûnê ra dibêje ez debara xwe bi vî karî berdewam dikim û hewceye li hember azadkirina wê hewceyê tu tiştêkî bidî min. Li ser daxwaza nêçîrvan, Mecnûn hespê xwe dide wî û bi vî rengî xezal azad dibe. Di berhema Sewadî da berê Mecnûn diçe Ka'be paşê xezalê azad kirinê. Lê di berhema Nîzamî da azadkirina xezalê li dû şerê ku di navbera Newfel û bavê Leylayê da di qewime da ye.

Di çîrokê da Nîzamî Xwestîye ku çîrokê bibêje, Sewadî jî xwestîye li gorî rê û rêbaza çîrokê berhema xwe bihûne.

### Çavkanî

Abdurehman Adak (2014), "Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Mesnewiyên Leyla û Mecnûnê", *Kovara Wêje û Rexne*, Hejmar 3, r. 100, rr: 99-119.

Abdurrahman Adak (2018), "Analîzeke Kodîkolojîk li Ser Leyla û Mecnûnên Sewadî, Bazîdî û fuzûlî di Koleksiyona A. Jaba ya Destnivîsên Kurdî de", *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, Ağustos-2018 Cilt:10 Sayı:3 (21), rr: 1197-1222.

Hacı Fîroz, *Leyla û Mecnûn*, Destnivîsa Pirtûkxana Petresburgê, v. 11.

Hasan Vahid Destgerdi (1386), *Hakîm Nizâmê Gencewî Leyla û Mecnûn*, Neşrî Qatre, Tehran  
Marûf Xeznedar (2010), *Mêjûy Edebî Kurdî*, I-VII, Dezgay Aras, Hewlêr, II, 507.





Mehmet Kanar (2007), “Nizamî Gencevî”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, Weşanên Türkiye Diyanet Vakfı, İstanbul, XXXIII.

Mela Ehmed Hilmî, el-Qoxî (2004), *Dîwana Cami*’, İhsan Yayınları, İstanbul.

Nesim SÖNMEZ (2018), *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî -Metn&Lêkolîn-* Weşanên Weşanxana Seyda, Çapa Yekem, Diyarbakır.

Parviz Jahany (2015), *Leyla û Mecnûna Sewadî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Mardîn, r. 29.

Qanatê Kurdo (1983), *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Weşanên Öz-Ge, Çapa 2yan.

Siwadî (1999), *Leyla û Mecnûn*, (Tîpderbasîya Latînî: M. Reşit Irgat), Weşanên Nûbiharê, Çapa 1em İstanbul.

Tehsîn İbrahîm Dosikî (2004), *Leyla û Mecnûn*, Weşanên Sipîrêz, Duhok,.